Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :444 nameronahi@gmail.com 31- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Efrînê sûcên şer



Erdnîgariya Efrînê nava gelên Sûriyê de wek sembola aştî û hezkirinê dihate naskirin û herêmeke xweşik bû ku dilê mirovan pê geş dibû. Lê îro hatiye dagirkirin û bûye cihê tirs, kuştin û talanê.
Di meha destpêkê ya êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê



li dijî Efrînê de 232 welatiyên sivîl, di nav de 35 zarok û 29 jin, şehîd bûn, 668 sivîl jî ku di nava wan de 90 zarok û 100 jin hene jî birîndar bûn.
Di meha duyemîn a êrîşan de hejmara qurbaniyên sivîl gihişte 300'î û hezar û 200 kes jî birîndar. Hejmara kesên ku piştî dagirkeriyê şehîd bûne ne diyar e, hinek derdorên têkildar guman dikin ku di pêvajoya şerê 58 rojan de zêdetirî 500 sivilî ji wan 51 jin jiyana xwe ji dest dane û 5 hezar jî birîndar bûne.
Li dijî êrîşan şervanên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) berxwedaneke qehremanî nîşan dan, gel li dora şervanan bûne yek. Di meha destpêkê de şervanan derbên giran li artêşa Tirk û çeteyan dan, zêdetirî 4 hezar leşker û çete hatin kuştin.
Binpêkirinên Tirkiyê û çeteyên wê ji rojên destpêka êrîşê de destpêkirin. Dema çeteyan gundê Qestel Cindo dagir kir, gefa kuştinê li welatiyên Êzidî dikirin, digotin an hûn ê bibin misilman an em ê we bikujin.
Di nava şer de çeteyan dîlên şer dikuştin û destdirêjiya cenazeyan dikirin, mîna destdirêjiya li ser cenazeyê şehîd Barîn Kobanê.
Piştî ku artêşa Tirk û çeteyên wê Efrîn dagirkirin, rewş li Efrînê bi tevahî hate guhertin, kiryarên rojane yên li dijî mafên mirovan, dizî, talan, kuştin revandin ketin rojeva cîhanê. Ewlehî li Efrînê nema.
Parêzer û hevserokê rêxistina mafên mirovan Mihemed Cemîl dibêje "Tiştên ku li Efrînê dibin ên mîna girtin, revandin, dizî û talanê sûcên şer in, li ber çavên cîhanê pêk tên. Dagirkeriya Tirk hemû pîvan û zagonên navneteweyî binpê kirin.
"Em roniya rojê nabînin, ez û keçikên xwe yên biçûk tenê li malê rûdinin, em newêrin derkevin." Ev gotinên jineke Êzidî ne ku li Efrînê rûdine, li Efrînê dijî lê nizane çi li derve dibe, bi rêya telefonê bi hin xizmên xwe re diaxive û dibêje "Eger hêviya me bi rizgarkirina Efrînê bişikê, em ê ji bajêr derkevin."





## ZÊDEYÎ HEZAR Û 500 KES HATINE REVANDIN

Di rewşa heyî de, li Efrînê ewlekarî pir xirab e, li herêmê bi dehan saziyên ewlekarî û îstixbaratê hene, lê herêm di navbera komên çete de hatiye parvekirin, her komek li herêma xwe diziyê dike û pereyan kom dike. Jixwe artêşa Tirk van karên diziyê bi rê ve dibe. Ji 20`ê meha Adarê heta 1`ê meha Tebaxê li Efrînê nêzî 300 traktor û 218 erebe hatine dizîn, her wiha bi hezaran motor û jeneratorên elektrîkê, alavên kargehên zeytûnê, kel û pelên malan û dikanan hatine dizîn.
Di nava 4 mehên desrbasbûyî de hezar û 500 kes hatine revandin û girtin û ji bo berdana wan pere ji malbatên wan hatiye xwestin. Heta niha der barê rewşa 450 girtiyan de agahî tune ye, her wiha 15 sivîl hatine kuştin, ji wan 4 kes Êzidî ne. Gundên Êzidiyan hatin dizîn û talankirin, di serî de gundê Qestel Cindo hate talankirin û welatî ji gund hatin derxistin. Li gorî daneyên Yekitiya Êzidiyên Efrînê heta niha nêzî 50 welatiyên Êzidî ji gundên Qîbarê, Qestel Cindo, Baflûr, Qitmê, Feqîra û Basûfan hatine revandin. Her wiha dagirkeriya Tirkan cihên pîroz û sembolên olî yên Êzidiyan jî hilweşandin.
Dewleta Tirk û çeteyên wê niha hewl didin bi darê zorê welatiyên Êzidî bikin misilman...*ANHA*







Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 444 31- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## HSM'ê li Dêrazorê buro vekir

Partiya Sûriya Pêşerojê gundê Mehîmîdiya yê Dêrazorê buroya xwe bi merasîmekê vekir. Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Îbrahîm El-Qeftan axivî û vekirina buroyê li şêniyên Dêrazorê pîroz kir û diyar ku partiya wan a hemû gelê Sûriye ye û wê ji bo demokratîkbûna Sûriyê xebatên xwe dewam bike. *R-4*



# EFRÎN LI DAGIRKERAN BUYE DOJEH

**Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin, kiryarên xwe yên hovane roj bi roj zêde kirin. Şervanên YPG'ê jî li dijî dagirkeran dest bi çalakiyan kirin. Heta niha gelek serçete û kesên xayîn di encama çalakiyên şervanên YPG'ê de hatin kuştin.**




## 19 ÇETE HATIN KUŞTIN

Şervanên YPG'ê li Efrînê li dijî esker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk çalakiyên bi bandor lidardixin. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku roja 29'ê Tebaxê ji bo bîranîna du şervanên xwe yên di encama komployê de hatine şehîdxistin, li dijî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê çalakiyên tolhildanê pêk anîn. Herî kêm 19 dagirker hatin kuştin. *R-5*

## MALBATÊN ÇETEYAN DIREVIN

Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê jî li rojhilatêbakurê Helebê li dijî serçete yê bi navê Ebû Mihemed El Domanî yê girêdayî koma çete ya bi navê Sûltan Mûrad çalakiyeke sabotajê kir. Serçete Domanî hate kuştin. Her wiha ji ber zêdebûna çalakiyên YPG'ê yên li Efrînê malbatên çeteyan ên ji derve hatine, dest bi reva gundên li ser sînor kirin. *R-2*

## Aloziya Sûriyê wê bi hêzên Sûriyê çareser bibe



Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Hisên El-Elî diyar kir ku Tirkiye ji ber rewşa Îdlibê di nava krîzeke kûrde ye. El Elî li ser hevdîtinên MSD'ê û rêjîmê jî got, "Hevdîtin gaveke girîng e. Aloziya Sûriyê wê bi hêzên Sûriyê çareser bibe." *R-4*

## Tecrîda li ser Ocalan nebuya îro kaos jî tunebû



Parlamentera berê ya HDP'ê Tugba Hezer bi wesîleya 1'ê îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê balkişand ser rola Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a di aştiyê de û diyar kir ku ger tecrîda li ser Ocalan nebûya wê îro ev kaosa heyî jî nebuya. Hezer wiha got, "Divê em hemû sazî û gel li dijî tecrîdê berpirsyariya xwe bînin cih û têkoşînek mezin pêş bixin." *R-4*

## Gerîla li Lêlîkanê ji du baskan ve lê da



Çalakiyên gerîlayên HPG'ê li dijî artêşa Tirk berdewam dikin. Artêşa Tirk her roj li hembr gêrîlayan windahiyên mezin dide. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand hêzên gerîla 29-30'ê Tebaxê li herêma Bradostê li girê Lêlikanê ji du baskan ve du çalakî li dijî hêzên dagirker ên Tirk kirin. *R-2*

## Li dijî tecrîdê divê em dengê xwe bilind bikin



Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê nirxand û got, "Tecrdîkirina Birêz Ocalan tê wateya tecrîdkirin çareserî û aştiyê. 1'ê Îlonê li dijî tecrîdê divê her kes rabe ser piyan û biherike qadan." *R-4*

## Dewleta Tirk ketiye krîzeke kûr û tengijî ye



Navenda Civaka Kurd a Demokratîk li Swêdê ji bo yek ji fermandarê HPG'ê Atakan Mahîr û ji bo Endamê Koordînasyona Êzîdî Zekî Şengalî ku bi êrîşa dewleta Tirk şehîd bûn bernameyek bîranînê pêk anî. Hevserokê Kongra Gel Remzî Kartal di bîranînê de axivî û diyar kir ku dewleta Tirk a ji ber têkoşîna Tevgera Azadiya Kurd ketî krîza aborî pirr tengijî ye. *R-5*




## Ji bo azadiya Ocalan li Başûr rêzeçalakî tên lidarxistin

Bi boneya 1'ê Îlonê roja aştiyê ya cîhanê li çend navçe û bajarên Başûrê Kurdistanê yên weke Silêmanî, Hewlêr, Ranya, Çemçemalê bi pêşengiya Rêxistina Jinên Azad ên Kurdistanê (RJAK) bi dirûşmeya 'ti tiştek ji azadî û aştiyê bi nirxtir nîne' rêzeçalakî wê bên lidarxistin. *R-2*

# Gerîla li Lêlîkanê ji du baskan ve lê da

***Çalakiyên gerîlayên HPG'ê li dijî artêşa Tirk berdewam dikin. Artêşa Tirk her roj li hembr gêrîlayan windahiyên mezin dide. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand hêzên gerîla 29-30'ê Tebaxê li herêma Bradostê li girê Lêlikanê ji du baskan ve du çalakî li dijî hêzên dagirker ên Tirk kirin.***



Gerîlayên HPG'ê li Başûrê Kurdidstanê, li herêma Bradostê li girê Lêlikanê ji du baskan ve du çalakî li dijî hêzên dagirker ên Tirk kirin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand hêzên gerîla 29-30'ê Tebaxê du çalakî li dijî artêşa Tirk kirine.
Derbarê çalakiyan ku hatî gotîn bi çarçoweya ''Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî' pêk hatî, ev agahî hatin parvekirin:
''29'ê Tebaxê saet 11.00'an hêzên me li herêma Bradostê ya Sidekanê, li girê Lêlikê çalekiyek li dijî leşkerên dijmin kirine. Di çalakiyê de ji du baskan ve hêzên me bi ser kozikên dijmin ve çûne, di vê çalakiyê de ji leşkerên dijmin çend hatine kuştin û çend birîndar bûne tam nehate tespîtkirin.
30'ê Tebaxê saet 07.00'an hêzên me du caran çalakî li dijî hêzên dagirker ên li Lêlikanê kirine. Di çalakiyê de derbên serkeftî li kozik û starayên leşkerên dijmin dane, di çalakiyê de leşkerên dijmin çend hatine kuştin û çend birîndar bûne diyar nebûye.''
Di daxuyaniyê de her wiha hate gotin 29'ê Tebaxê saet 17.00 û 18.00'an balafirên şer ên artêşa Tirk mintiqeya Gundê Guzê ya qada Bergarê ya herêma Garê ya Qadên Parastine Medyayê bombe kirin. HPG'ê got, ''Di bombekirinê de tiştek bi ti gerîlayê me nehatiye''.

## Ji bo azadiya Ocalan li Başûr rêzeçalakî tên lidarxistin




Di roja aştiyê ya cîhanê de bi pêşengiya RJAK'ê li çend navçe û bajarên Başûrê Kurdistanê li dijî tecrîda li ser Ocalan wê rêzeçalakî bên lidarxistin û daxwaza azadiya Ocalan bê kirin.
Bi boneya 1'ê Îlonê roja aştiyê ya cîhanê li çend navçe û bajarên Başûrê Kurdistanê bi pêşengiya Rêxistina Jinên Azad ên Kurdistanê (RJAK) bi dirûşmeya 'ti tiştek ji azadî û aştiyê bi nirxtir nîne' çend rêzeçalakî tên lidarxistin.
Cih û demên çalakiyên bên lidarxistin:
Silêmanî
1'ê Îlona 2018, Sekoy Parka Azadî ya Silêmaniyê, saet 18:00'ê
Ranya
1'ê Îlona 2018, meş ji Seîdawa heya Baxê Giştî yê Ranya, saet 17:00'ê
Kifrî
1'ê Îlona 2018, Qehwexaneya Kultirî, saet 17:00'ê
Çemçemal
1'ê Îlona 2018, Pirtûkxaneya Çermo ya Çemçemal, saet 16:00'ê
Hewlêr
1'ê Îlona 2018, li ber avahiya Neteweyên Yekbûyî (NY) a Hewlêr, saet 16:00'ê
Bi dirûşmeya 'ji bo şer ne, ne ji bo faşîzmê' di 1957'ê de sendîka û komên aştî li Elmanya salane 1'ê Îlonê weke roja dijî şer û dijî faşîzmê bi dehan çalakî lidar dixin û roja aştiyê ya cîhanê pîroz dikin.

## Malbatên çeteyan ji Efrînê direvin



Li Efrînê di demên dawî de çalakiyên li dijî artêşa Tirk û çeteyên wê zêde bûne. Hate ragihandin ku malbatên çeteyan ên ji derve hatine, dest bi reva gundên li ser sînor kirin.
Li gorî nûçeya ANHA`yê sibeha roja Pêncşemê saet di 05:00`an de li nêzî Çerxerêya Kawa ya navenda bajarê Efrînê teqînekê pêk hatiye û têkildarî ziyanên teqînê ti agahî nehatin girtin.
Çavkaniyên herêmî yê ji Efrînê ragihandin ku malbatên çeteyan ên ku ji derveli Efrînê bi cih bûne, piştî teqîn û çalakiyan bi gundên ser sînor ve direvin. Hate ragihandin ku di nava du rojên dawî de malbatên çeteyan berê xwe dane gundên li ser sînor.
Heman çavkaniyan da xuyakirin ku çeteyên ku xwe li Efrînê, dikanên bazirganiyê û cihên kar ên ku ji welatiyên sivîl ên Efrînê standine, bêyî sedem vala dikin.
Her wiha hate destnîşankirin ku li Efrînê ji duh ve li nêzî Çerxerêya Kawayê Hesinkar a navenda bajarê Efrînê di navbera çeteyên El-Sûltan Mihemed El-Fatih û çeteyên Firqa 9 ên girêdayî dewleta Tirk a dagirker de şerekî dijwar derketin. Li gorî agahiyan kuştî û birîndar ji her du aliyan hene.
Dîsa hate ragihandin ku li nêzî Çerxerêya Newroz li ser rêya Raco ya navenda bajarê Efrînê teqînek pêk hat. Li gorî agahiyên destpêkê 3 leşkerên Tirk, çeteyek, 4 kesên Xûta El-Şerqiye ku li Efrînê bi cih bibûn hatin kuştin, her wiha zêdetirî 20 kesên din jî bi giranî birîndar bûne.

## Sadr bang kir ku 'milyonek kes' tevlî nimêja Înê bibin




Lîderê Şiî yê Tevgera Sadir û berpirsê lîsteya Saîrûn ê Iraqê Mûqtade El Sadr, di demeke amadekariyên hikûmeta nû tê kirin de, bang li alîgirên xwe kir ku milyonek kes tevlî nimêja roja Înê bibin.
Serketiyê hilbijartina 12'ê Gulanê Sadr, bi daxuyaniyeke nivîskî banga bi girseyî tevlî nimêja Înê bibin kir. Hedefa Sadr milyonek kes tevlî nimêjê bibin.
Sadr ê got: "Kesên nelirêtî kirîn bihejînin" daxwaz ji kesên ku nimêj bikin ku kevin li xwe bikin.
Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Ji mezhebî, nelirêtî, cudakerî, teror û dagirkirinê re na."
Sadr destnîşan kir ku ji bo ji nû ve avakirina Iraqê pêwîstî bi nerazîbûnên aştiyane heye û daxwaz kir ku guh bidin meclîsa Şiî.
Lîderê Şiî herî dawî diyar kir ku ji bo desthilata Iraqê, divê welat ji aliyê kesên kêrhatî ve bê birêvebirin.

## Bendav hilweşiya; 80 gund di bin avê de man



Li Myanmarê bendavek hate hilweşandin. Di encama wê de nêzî 85 gund di bin avê de man û zêdetirî 63 hezar kes neçarî koçberiyê bûn.
Li gorî dezgehên çapemiyê li Myanmarê di encama hilweşandina bendavekê DE nêzî 85 gund di bin avê de man, rêyên sereke li herêmê hatin girtin, her wiha zêdetirî 63 hezar kes neçarî koçberiyê bûn.
Rojnameya Rûsya Todey diyar kir ku tîmên rizgarkirinê berê xwe da cihê bûyerê da ku alîkariya welatiyan bikin.

## Ev 7 sal in parêzer nikarin Ocalan bibînin



Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo ku miwekilê xwe bibînin cara 783'an serlêdana xwe kirin.
Parêzerên Ocalan tam 7 sal û 34 roj in nikarin miwekilê xwe bibînin.
Parêzer Cengîz Yureklî, Mazlûm Dînç û Fuat Çoşacak ji bo ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bibînin serî li Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê dan. Serlêdanên ku ji 27'ê Tîrmeha 2011'an ve têne kirin, bi hincetên mîna 'muxalefeta hewayê', 'koster xirabe ye', 'koster li ber tamîratê ye' û 'Rewşa Awarte' bi rengekî kêfî û nehiqûqî nayên qebûlkirin.



# Sterkek din ji Radyoya Êrîvanê koç kir: Mecîdê Silêman

**Helbestkar û dengbêjê Kurd, kedkarê Radyoya Êrîvanê Mecîdê Silêman di 81 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Silêman ku sempatîzanê Tevgera Azadiya Kurd bû, bi welatparêziya xwe dihate naskirin. Mecîd bi denbêjiya xwe û helbestên xwe balê dikişine ser xwe, bi dehan salan li radyoya Êrîvanê dengbêjiyê dike.**




Kedkarê Radyoya Êrîvanê, Hebestkar û Dengbêj Mecîdê Silêman çû ser dilovaniya xwe.
Helbestkar û dengbêjê Kurd, kedkarê Radyoya Êrîvanê Mecîdê Silêman di 81 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe.
Mecîdê Silêman 1937'an li Ermenîstanê, li gundê Semenkaşê hatibû dinê. Bavê Silêman, Mihemedê Siloyê Miho Zakavkaz ku yekî hejar bû, piştî ku dibistana mamostetiyê diqedîne li gundê Davîtaşên dibe muxtar û bi malbata xwe re diçe gund.

### BI WELATPARÊZIYA XWE DIHATE NASKIRIN

Mecîdê Silêman 1964'an li Enstîtûya Çandiniyê ya Êrîvanê beşa veterîneriyê diqedîne. Mecîd bi denbêjiya xwe û helbestên xwe balê dikişine ser xwe, heman salan li radyoya Êrîvanê dengbêjiyê dike. Helbestên Mecîdê Silêman li Ermenîstanê û Qezakîstanê dibin pirtûk.
Silêman 1990'î bi malbata xwe re koçî Qezakîstanê dike. 1992'yan li Qezakîstanê, li gundê Aşîbûlakê koma şano û govendê ava dike. Di rêxistina Kurdên Sowyetan de bi çalak cih girt, tevlî avabûna Yekbûnê bû, ku rêxistiniya pêşî ya Kurdên Sowyetan bûn. Silêman ku sempatîzanê Tevgera Azadiya Kurd û PKK'ê bû, bi welatparêziya xwe dihate naskirin.

## *Pêşangeha Şaristaniyên Mezopotamyayê vedibe*




Hevserokê Komîteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê Elî Elaya ragihand ku di 1'ê Îlonê de pêşangeha El-Ensab (xizm) a şaristaniyên Mezopotamyayê di bin dirûşmeya "Biratiya gelan rastiyek e û ne dirûşmeyek e" de wê were vekirin.
Hevserokê Komîteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê Elî Elaya ragihand ku hevkarî bi komeleya El-Ensab a Zanistî ya qebîleyên Ereban û Partiya Sûriya Paşerojê re pêk hatiye da ku peywendiyê bi dewletên erebî û kesayetên dîrokî û çandî re bikin da ku bêne vexwendin û beşdarî çalakiyên pêşangeha El-Ensab a şaristaniyên Mezopotamyayê bêne kirin.
Armanca pêşangeha El-Ensab El-Erebiyê ew e ku şaristaniyên li ser axa Mezopotamyayê jiyane, bêne nasandin. Her wiha ji aşiqên çand û kevneşopiyê re xebatên dîrokî yên gelên herêmê zelal dike, bi taybetî bi riya nexşe, fikr û semîneran rêbaz û şêwazên ku hiştine ev şaristanî bibin xwedî girîngiyeke dîrokî ya mezin bêne gotûbêjkirin.
Di pêşangehê de wê nexşe û wêneyên hin kesayetên qebîle û eşîrên Ereb, Kurd, Suryan, Çerkez û Asûr bêne pêşandan.
Elaya diyar kir ku di pêşangehê de wêneyên hin kesayetên dîrokî ku xwedî bandor û roleke mezin di pêkanîna fikr û têkoşîna civakê de di hemû aliyan de bêne pêşandan, bi taybetî hin taybetmendî heta niha tên jiyîn ku çand û huner gelan nêzî hev dike û rola wan di aramiya fikrî û hişmendiya gelan de mezin bû.
Hêjayî gotinê ye piraniya şaristaniyên Mezopotamyayê ji ber şerên li herêmê rû dane hatine pişaftin. Herî dawî dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê ku gelek peyker û nexşeyên şaristaniyên mirovahiyê li herêmê dizîn û di bazarên Tirkiyê de hatin firotin…*ANHA*

## Mihrîcana Çanda Kurd a Navnetewî ji aliyê Platforma Efrînê de tê lidarxistin

Kurdistaniyên li Ewropayê xwe ji bo Festîvala Çanda Kurd a Navneteweyî amade dikin.
Festîval wê 8'ê Îlonê li bajarê Dînslake yê Elmanyayê pêk were. Bernameyeke dewlemend a festîvalê heye.
Festîval wê ji aliyê Platforma Efrînê ve bê lidarxistin. Tê payin ku Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan, siyasetmedarê Kurd ê ji Rojavayê Kurdistanê Aldar Xelîl, Şaredarên hin bajarên Îtalyayê, endamên Partiya Çep a Elmanyayê û endamên Partiya Keskan a Elmanyayê tevlî festîvalê bibin.
Koma Muzîkê ya TEV-ÇAND'ê, Mikaîl Aslan, Efkan Şeşen, Chopî, Hozan Diyar, Hozan Mizgîn jî wê derikevin ser dikê. Koma govendê jî wê hunera xwe pêşkêş bike.
Ji bo ciwanan jî wê konên semîner û panelan hebin. Tevî standên îmze û agahdarkirinê, wê gelek kon bên vedan.
Ji bo zarokan jî wê parkeke lîstikê hebe.



## Jiyana Komîmal û parastina Çandê



Hozan SEYÎDXAN

Hemû gel ji bona parastina nirxên xwe yên çandê di nav jiyana dîrokê de biparêze, ta ku hebûnê bidomîne û nasnameya xwe ya azad bidest bixe têdikoşe.
Ev têkoşîna ji heman gelên din wêde tir, pê diviya gelê kurd pê heye.
Civaka ku hebûna we hatibe înkarkirin,nasnameya wê neyê nasîn. Civaka ku zimanê wê hatibe qedexekirin,hunera wê-mûzîka wê hatibe dizîn û berevajî kirin; ji hemî kes û civakan bêhtir, pêwîste ku parastina çand û hunera xwe bike.
Di vê pêvajoya ku niha gelê Kurdistan dijî û têre derbas dibe, di seride dewleta tirk û dewletên dagirker li dijî daxwaza jiyan û nasnameyeke azad bi hemî êrîş, şêwe yên xwe yên hovane gelê me mecbûrî koçberiyê dike, ji cih û warên wan yên jiyanê qut dike, di qirkirinê re derbas dike, armanç û daxwaza wan ewe ku gelê kurd ji hebûna wî ya çandî tune bike.
Dinava vê sed sala dawî de pir caran li Kurdistan komkujî pêk anîne. Di encama her komkujiyekê de ji kokêve rêxistinbûyîna wî hatiye belav kirin û civaka wî perçekirine. Her wiha xwestine bi polîtikayên asîmilasyonê gelê me bikin biyaniyê çand û hunera xwe a xweser.
Gelê kurd di vî 40 salên dawî de li dijî qirkirina çandê bi berxwedana parastina hebûna xwere gelek nirx yên destkeftî bi dest xistine û ji mirovatiya pêşketîre da zanîn ku wê mîna gelên din wê gelê kurd ti caran ji dîrokê ranebe û neyê wendakirin.Li hêleke dinê ve ji ber ku çanda gelê kurd a resen çavkaniyên xwe ji civakbûnê û koka çanda xwe ya kevnar wergirtiye, dagirkeran bi polîtikayên asîmilasyonê,Qirkirin û zordarî nedikarîbûn gelê kurd tune bike.
Ji ber ku civaka kurd yekem xwedî taybetmendî yên avakerê çanda komînal bû ji kokaka xwe ne hatiye hilkirin. û her demê di nava parastin û berxwedanê de bûye.Tevî hemî asîmiliyason û qedexekirina li ser civaka gelê kurde hatine, lê bi saya wê çanada berxwedêr di qadên wek huner , govendên gelêrî,dengbêjî û mûzîka kurdî, li ser zar û zimanan û nivîs bi nivîs hetanê vê roja ku em tê dene anîne.
Pêwiste hemû kurdên hestiyar û bi rêxistin buyî li her dera jiyanê ji bo pêşde xistin, jînkirin û parastina çanda komînal,têbikoşe.Bê guman ev erka yekem erka hunermend û rewşenbirên kurdin jî.
Di encama xebatên rêxistinkirî dikarin evan nirx û berhemên ku têne bi dest xistin da ku ji civak û mirovahiyê re bêne pêşkêş kirin. Her yek ji me vê weke erkekî dîrokî bizane hingî dikarin şoreşa çandê bi serbixin.
Îro gelê kurd ji pêşxistina şoreşa netewa demokratîk, Jê hêz û kelecaneke mezin werdigrin. Di vê pêvajoya dîrokîde li şûna bê dengî û temaşekirinê, pêwîste xwedî helwest liv û tevgerbin, û asta xebatên bi nirx bingeh bi girin û bi pêşde bixin.Bi va baweriya ji gelê rojhilata navînre dikarin bibin çavkaniya ronesansa çanda komînal..Di vê naberê da stêrkekedin jinav me koca xwe barkir.. Dengbêja navdar a Kurd Gazin (Raziye Kizil)20.08.2018 an de ji ber krîza dil di 57 saliya xwe de li Wanê koça dawî kir Raziye Kizil ku di nav gel de wek "Dengêbêj Gazin" dihate naskirin, sala 1959ê li navçeya Tetwan a Bêdlîsê ji dayîk bû. Wê ji zaroktiya xwe ve dest bi gotina kilaman kir. Dengbêj Gazin, ku di jiyana xwe ya hunerî de 12 albûm derxistine, bi deng û awaza xwe li Bakurê Kurdistanê bû sembola dengbêjên jin. Ew li ser riya Eyşe Şan û Meryem Xanê diçû.Bi rêzgirtin bi bîrtînim..

# Welatî ji nebaşbûna nan bi gazinc in

***Li bajarê Hesekê tevî ku 33 firin dixebitin jî, lê welatî di peydekirina nan de zehmetiyan dibînin. Her wiha welatiyên Hesekê ji ber nebaşbûna nan jî gazincan dikin. Welatî ji saziyên pêwendîdar dixwazin ku vê pirsgirêkê çareser bikin. Rêveberiya Komîteya Firinan jî diyar kir ku ew ê vê pirsgirêkê çareser bikin.***

Welatiyên Hesekê ji ber nebaşbûna nan gazincan dikin. Aliyên têkildar jî sedema vê pirsgirêkê dispêrin nebaşbûna ard. Rêveberiya Aborî jî hewl dide pirsgirêkê çareser bike.
Di demên dawîn de li bajarê Hesekê tevî ku 33 firin xizmeta şêniyên bajêr dikin, lê şênî di peydekirina nan de zehmetiyan dibînin.
Jina ku nan li taxa Kelasê belav dike Fetûma Şêxmûs destnîşan kir ku miqdarê nan pir kêm e, nanê ku ji wan re tê ne yê xwarinê ye, ne baş e û ev yek dihêle ku kesên nan belav dikin tu sûdê ji belavkirina nan nebînin, ji ber ku welatî wî nanê nebaş ku piraniya wî şewitiye, nakirrin û ji ber vê yekê jî welatî gazincan dikin.
Fetûma diyar kir ku wê bi xwe gazincên welatiyan ji komîteyên zimhêrê û ya zabîtê yên şaredariyê re biriye û heta niha tu bersiv ji




wan re nehatiye dayîn.
Di nava gazincên welatiyan de ku nanê ji firinên siyahî dikirin pir buha ye, her rebteyek nan li firina mezin bi 100 lîreyên Sûrî tê firotin lê li firina siyahî bi 200 lîreyî ye. Her wiha dayika Ehmed a ji taxa Til Hecer xwest nanê baş ji wan re were peydekirin.
Dayika Farûq destnîşan kir ku nanê firnên mezin nayên xwarin ji ber wê neçar dimînin ku nan ji firinên taybet bikirin.
Di çarçoveya gazinên welatiyan de yek ji rêveberên Firina 8'ê Adarê Hisên Mihemed diyar kir ku ew di rojê de 18 saetan kar dikin, nan ji ber ard ne baş e, gelek caran ardê kevn ji wan re tê şandin, her wiha rêjeya genimê ter di ard de kêm e.
Desteya Aborî ya Kantona Hesekê di demên dawîn de Komîteya Firinan ji bo ku karê wan bişopîne, pirsgirêkên wan çareser bike û gazinên welatiyan pêk bîne, ava kir.
Yek ji rêveberên Komîteya Firinan Şefîq Silêman destnîşan kir ku ew bi hêzên Ewlekariya Bendavan ên girêdayî hêzên Ewlekariya Hundirîn re di nava têkliyê de ne da ku ardên sexte û nebaş derbasî bajêr nebe. Silêman diyar kir ji ber ku komîteya wan nû ye û têkiliya wan bi aliyên peywendîdar re kêm e, welatî gazincan dikin.
Silêman destnîşan kir ku piştî komîteyên xwe di nava komîn û meclisan de bi rêxistin bikin wê li gazincên welatiyan guhdar bikin, wê vê pirsgirêkê çaraser bikin… *ANHA*

## Welatiyên Dirbêsiyê dixwazin rêyên wan bên çêkirin



Şêniyên navçeya Dirbesiyê ji ber xirabûna rêyan zehmetiyan dikişînin. Şaredariya Gel a navçeyê soz da ku rêyan sererast û qîr bike. Lê derfetên şaredariyê têrê nake.
Derdora 187 gund girêdayî navçeya Dirbesiyê ne. Piraniya rêyên van gundan bi çal û kort in. Ji ber vê jî welatiyên van gundan xwestin ku çareserî were dîtin.
Welatiyê bi navê Umer Comerd ji gundê Umerzobaş bang li şaredariyê kir ku ji nû ve rêyan qîr bike û wiha got: "Rê gelekî xirab bûne, me daxwaznameyek ji şaredariyê re pêşkêş kir, şaredarî soz da lê heta niha em li benda pêkanîna wê sozê wê ne."
Welatiyê bi navê Hemed El-Hewas ê ji gundê Bab El-Selam diyar kir ku ji ber nebaşiya rê ew naçin navçeyê.
Hevserokê Şaredariya Gel a Dirbesiyê Salih Ibrahîm girêdayî mijarê wiha got: "Em dixwazin hemû rêyên navçeyê sererast û qîr bikin, lê ji ber kêmderfetan tişt ji destê me nayê."
Her wiha Ibrahîm tekez kir ku dema derfet peyde bûn, wê rêyan sererast bikin…*ANHA*



## Xirabûna rêyê xetereyê li ser jiyana ajokaran dike

Ji ber lehiya ku ji çiyayê Şengalê tê, rêya di navbera navçeya Til Koçber û navçeya Holê xira bûye û ajokar ji ber vê yekê zehmetiyan dibînin û xetere li ser jiyana wan çê dike.
Ji ber barana dawî ku biharê barî, rêya di navbera Til Koçer û Holê de xira bûye. Cihê ku xira bûye, bi dirêjahiya 433 metre ye. Ew rê herêma rojhilat û rojavayê Cizîrê bi hev ve girê dide. Ji ber wê jiyana ajokaran û kesên ku di wê derê re derbas dibin, dixe xetereyê.
Welatiyên ku di wê rêyê re derbas dibin bang li şaredariyan kirin ku vê pirsgirêkê çareser bikin, ji ber ku rê xira bûye û du erebe nikarin ji berhev re derbas bibin.
Ajokarê bi navê Îbrahîm El-Hemze diyar kir rê jiyana ajokaran dixe xetereyê. El-Hemze bang li aliyên pêwendîdar kir ku rewşa rê di ber çavan re derbas bikin û xetereya li ser jiyana ajokaran çareser bikin.
Miwefeq Salih El-Xelef ê ji gundê Xiwêtle El-Dişo da zanîn ku gelek ajokar guh nadin aliyên xirabûyî, ji ber wê xetere li ser jiyana wan zêde dibe û destnîşan kir ku pêwîst e ew rê di demeke nêz de were sererastkirin.
Di vê çarçoveyê de hevserokê Şaredariya Gel a Til Hemîs a girêdayî kantona Qamişlo Abdulrehman El-Hadî anî ziman ji bo ku cihên xirabûyî diyar bikin gelek caran çûn wê derê û destnîşan kir ku pêwîstiya wan bi kobriyan heye da ku di dema baran û lehiyê de, rê neyê girtin û çûn û hatin jî neyê astengkirin.
El-Hadî destnîşan kir ku ew amadekariyên sererastkirina rêyê di demeke nêz de bikin…*ANHA*

## Li bajaroka Ceza xwedîkirina mirîşkan

Ji bo peydekirina pêwîstiya bajarokê Ceza, şêniyên gundê Filistîn ê Rojhilat (El-Şara) ê girêdayî bajarokê Cezaa 7 çewlikên mirîşkan vekirin.
Bi armanca pêkanîna debara bajarokê Ceza ji goştê mirîşkan, xwediyên çewlikên mirîşkan baştirîn cureyên aşle û dermanan bi kar tînin.
Di vê demê de ji ber buhabûna êmê mirîşkan, tunebûna kurkgehan û erzanbûna mirîşkan ji ber anîna wê ji derve xwediyên mirîşkan astengiyan dikişînin.
Xwediyê mirîşkan Subhî El-Elî wiha got: "Armanca me ji xwedîkirina mirîşkan, peydekirina goşt ji bo şêniyên bajarokê bi lêçûnek kêm e."
Subhî destnîşan kir ku çewlikên (medcene) gund ji aliyê paqijî û kalîteyê ve baş in û goştên bê hormon hildiberînin. Subhî diyar kir ku wî piştî cejna Qurbanê bi du rojan hemû mirîşkên xwe firotin û tenê 83 mirîşk mirine û got: "Piştî firotinê em çewlikê paqij û pak dikin."
Subhî têkildarî astengiyên ku ew lê rast tên wiha got: "Av, mazot û êm kêm in. 5 bermîl av bi buhayê hezar û 500 lîreyên Sûriyê dikirin. Xwedîkirina çêçelokan mehek û nîv didome ji ber wê lêçûna avê digihîje 150 hezar lîreyên Sûriyê û ew jî li ser me giran e."



Xwediyê mirîşkan Waêl Ayiş diyar kir ku çewlik li herêmê projeyên biçûk û nû ne û derfetên kar ji şêniyên herêmê re peyda dikin…*ANHA*

## Dewreya perwerdeya jinên Êzidî bi dawî bû



Rêxistina Kenedî Mission Esat bi hevkariya Meclisa Gelê Xanesorê dewreyek perwerdê ji bo 400 jinan dabû destpêkirin, bidawî bû Rêxistina Kenedî Mission Esat bi hevkariya Meclisa Gelê Xanesorê dewreyek perwerdê ji bo 400 jinan dabû destpêkirin, piştî 40 rojan bi dawî bû. Li avahiya Meclisa Gel a Xanesorê ya Şengalê jinên perwerde xelaskirin bawernameyên xwe girtin.
Li ser naverok û armanca perwerdeyê Hevserokê Meclisa Gel a Xanesorê Saleh Xidir axivî û got; "Em spasiya Rêxistina Kenedî ya Mission Esat dikin. Ji destpêka fermanê ve gelek alikariya gelê me kiriye. Beriya 40 rojan ev dewreya perwerdê hatibû destpêkirin, bi dawî bû. Her wiha gelek karên çandî jî li Şengalê meşandin."
Saleh Xidir axaftina xwe bi van gotinan dawî kir; "Pêşketina jinê di nava civaka me de pir giringe. Giringe ku jin karibe xwe pêş bêxwe. Ji ber timî ji aliyê dijmin ve jina Êzidî hedef hatiye girtin."…*ROJNEWS*



# Tirkiye li Efrînê kiryarên dijmirovî didomîne

***Artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li Efrînê kiryarên hovane û dij mirovî bê navber didomînin. Jinên Efrînê yên ku li Şehbayê bi cih bûne bang li rêxistinên jinan û hiqûqnasan kirin ku helwestê nîşan bidin û rê li ber kiryarên wan bigirin.***

Jinên kantona Efrînê yên ku li Şehbayê bi cih bûne, kiryarên dagirkeriya Tirk yên li hemberî jinan şermezar kirin û bang li rêxistinên jinan û hiqûqnasan kirin ku helwestê nîşan bidin û rê li ber kiryarên wan bigirin.
Artêşa Tirk a dagirker kiryarên xwe yên nemirovî li dijî sivîlên Efrînê didomîne. Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve artêşa Tirk bi dehan jin revandine û destdirêjî kirine. Her wiha ji bo serbestberdana jinên revandî fidyeyê dixwazin.
Di 22'yê Tebaxê de videoyek di nav malperên medya civakî de hate belavkirin. Jinek bi navê Isra Yûsif Xelîl a 19 salî di videoyê de axivîbû û gotibû ku ew zewicî ye û bi darê zorê û gefa çekan, ji aliyê fermendarê Lîwaya Sultan Silêman El-Şah ê bi navê Ebû Emşe yê girêdayî çeteyên dagirkeriya Tirk e, rastî destdirêjiyê hatiye.
Her wiha di 23'yê Tebaxê de koma çete ya bi navê Firqet El-Sultan Murad a girêdayî artêşa Tirk keça bi navê Ayşe Abdulnasir a 20 salî ji taxa El-Mehmûdiye revandibû û piştî wê Ayşe li hemberî 5 milyon lîreyên Sûriyê serbest berdan.
Girêdayî mijara kiryarên dagirkeriya Tirk ya li dijî jinên Efrînê de welatiya bi navê Fatme Xelîl wiha got: "Artêşa Tirk a dagirker rojane sivîlan direvîne û dikuje. Kiryarên artêşa Tirk ji zîhniyeta qirêjî ya Erdogan tê. Divê dewletên ku mafên mirovan diparêzin rê li ber van kiryaran bigirin."
Welatiya bi navê Canda Silêman destnîşan kir ku Efrîn ji herêmên herî ewle û aram bû. Lê piştî kiryarên artêşa Tirk Efrîn veguherî herêma ku herî zêde rastî terorê tê.



Welatiya bi navê Hûriye Mihemed diyar kir ku kiryarên artêşa Tirk li Efrînê hemû pîvanên mirovî binpê kirin. Çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk rojane bi dehan sivîlan direvînin û dikujin. Her wiha Hûriyeyê destnîşan kir ku armanc ji van binpêkirinan, şikandina vîna gelan e…*ANHA*

## Jinên Hesekê êrîşên li ser Dayîkên Şemiyê şermezar kirin



Kongreya Star a Kantona Hesekê, êrîşên dewleta Tirk ên li ser Dayîkên Şemiyê şermezar kir.
Têkildarî mijarê Kongreya Star a Kantona Hesekê daxuyanî dan. Daxuyanî ji aliyê berpirsa Têkiliyên Dîplomasî Silava Şêxo ve hate xwendin
Daxuyanî wiha ye:
"Polîsên dewleta Tirk di çalakiya 700'î a ku Dayîkên Şemiyê ji bo naskirina çarenûsa ewladên xwe û ji bo hesab ji kesên berpirsyar bê xwestin pê radibin de êrîşî dayîkan kirin û 47 dayîk destgîr kirin. Dayîkên Şemiyê di 25'ê Tebaxê de li Stanbolê û li ser biryara Wezîrê Hundirîn Silêman Soylu yekser rastî tundiya polîsan hatin. Dayîk bi awayekî aştiyane wêneyên zarokên xwe hilda bûn, lê dewleta Tirk bêdeng ma û tu agahî derbarê ewladên wan de neda. Tevî berteka faşîst ya polîsên dewleta Tirk jî, Dayîkên Şemiyê bi vînek azad û hêzek xurt çalakiyên xwe dewam kirin.
Siyaseta hikumeta Tirk a faşît ne nû ye ji ber ku li ser girtin, tundî û çewsandina nasnameyên hemû kesên li dijî wan disekinin ava bûye.
Bi navê hemû partiyan, dengê gel û saziyên civaka sivîl em kiryarên dewleta Tirk û êrîşên wan li ser Dayîkên Şemiyê şermezar dikin."

## Êdî dema hatiye Ocalan azad bibe



Berdevka Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Tara Hisên diyar kir ku ne tenê gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn tevahî gelên cîhanê ji fikrên Ocalan sûd digrin û got; "Divê em xwedî li Ocalan derkevin û li hemberî tecrîdê bêdeng nemînin."
Berdevka Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Tara Hisên li ser fikrê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo çareseriya pirsgirêkên gelan û tecrîda girankirî ya li hemberî Ocalan axivî û diyar kir ku Ocalan girtîgeh vegerandiye dibistan û pirtûkxaneyeke çareseriya pirsgirêka Kurd.
Tara wiha got; "Komploya navdewletî ya ku 15`ê Sibata 1999`an li dijî Ocalan pêk hat, ji bo bêdengkirina dengê Kurd û ji holê rakirina Tevgera Azadiya Kurdistanê bû. Lê, welatên ku di vê komployê de cih girtin bi taybet jî Tirkiye texmîn nedikir ku wê gelê Kurd evqas bi hêz bibe. Ocalan girtîgeh vegerand dibistan û pirtûkxaneya çareseriya pirsgirêka Kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn."

### GEL ÇARESERIYÊ DI OCALAN DE DIBÎNIN

Tara Hisên diyar kir ku roj roj bi Tevgera Azadiya Kurdistanê mezin bû û wiha dewam kir; "Ji ber vê çendê Tevgera Azadixwaz a gelê Kurd her roj mezintir bû, bi hêztir bû. Bû şoreşek enternasyonal. Ne tenê gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn tevahî gelê cîhanê ji fikrên Ocalan sûd digrin û çareseriya pirsgirêkên xwe di fikrê Ocalan de dibînin."

### EM XWEDÎ LI OCALAN DERKEVIN

Tara Hisên bal kişand li ser tecrîda li ser Ocalan pêk tê û wiha pêde çû; "Tecrîdkirina Ocalan û rênedayîna hevdîtinên bi Ocalan re binpekirina mafê mirovan e. Ji ber vê çendê dewleta Tirk, rêxistinên mafê mirovan û CPT ji rewşa û jiyana Ocalan berpirs in. Ocalan ne şexseke, rêberê gelekî ye, filozof û rêberekî fikrî yê ku xwedî projeyên çareseriya pirsgirêkên gelan e. Mînaka vê jî Rojavayê Kurdistanê ye. Çareseriya niha li Rojavayê Kurdistanê berhemê fikrê Ocalan e. Ji ber vê çendê divê em xwedî li Ocalan derbikevin."
Berdevka Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Tara Hisên da zanîn ku fikrên Ocalan di nava gel de ye û got; "Ocalan fizikî di girtîgehê de ye, lê fikrê Ocalan di nava gel de ye û gel ji bo xwe kiriye bingeh. Desthilat bi derxistina krîzan û şer xistina nava ol û nijadan temenê xwe dirêj dikin. Êdî dema azadkirina Ocalan hatiye. Divê tevahî gelê Kurd, gelên azadixwaz û demokrat xwedî li Ocalan derbikevin. Ji bo azadiya Ocalan çalakiyên hîn berfirehtir bên lidarxistin. Nabe kesekî xwe Kurd hesab bike, kesekî xwe azadixwaz û demokrat bibîne li beramberî vê tecrîdê bêdeng be."…*ROJNEWS*



## Tecrîd sedema hemû krîzan e

Hevseroka DBP'a Amedê Naşîde Toprak diyar kir ku ji bo mîtînga 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê amadekariyên wan didomin û diyar kir ku tecrîd sedema hemû krîzan e û ji bo tecrîda li ser Abdullah Ocalan bi dawî bibe, şewata daristanan bisekine û balê bikşînin ser rewşa girtiyên nexweş divê her kes tevlî mîtîngê bibe.
Li Amedê di 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê de bi dirûşma 'Aştî nikare bê tecrîdkirin' saet di 16.00'an de li Qada Îstasyonê wê mîtîngek pêk bê. Amadekariyên mîtîngê bê navber didomin. Hevseroka DBP'a Amedê Naşîde Toprak diyar kir ku ji bo mîtînga 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê bi rojan berê dest bi amadekariyan kirine û got mijara esas a mîtîngê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e.
Naşîdeyê di berdewamiya axaftina xwe de daxuyakirin ku polîtîkayên tecrîdê sedema herî mezin a bûyeran e û wiha got: "Şewata daristanan a li Kurdistanê, neberdana girtiyên nexweş, kuştinên jinan, êrîşên zayendî ên li dijî zarokan ji ber bandora tecrîda Îmraliyê pêk tên.

### AŞITÎ NIKARE BÊ TECRÎD KIRIN

Naşîdeyê anî ziman ku Tirkiye niha kaosê dijî û wiha dewam kir: "Di alî aborî, civakî û siyasî de têkçûn tên jiyîn. Tecrîd sedema her cureyê bûyera xerab e. Heta tecrîda li ser Birêz Abdullah Ocalan bidome wê bûyerên wisa karaset bidomin. Em ê di 1'ê îlonê de li Amedê bi dirûşma 'Aştî nikare bê tecrîdkirin' li qada bin. Yekane daxwaza me ev e ku demildest tecrîda li ser Birêz Ocalan bi dawî be.
Naşîdeyê balkişand ser şewata daristanan a li Kurdistanê û got ev şewat ji aliyê dewletê bi zanebûn pêk tên û balkişand ser şewata daristanan a ev 4 hefteye li Dêrsîmê didome û da zanîn ku di van şewtanan de gelek zindî telef bûne.

### LI DIJÎ ZILMÊ 1'Ê ÎLONÊ

Naşîdeyê her wiha êrîşa li hemberî Dayikên Şemiyê jî bi bîr xist û destnîşan kir ku wê li dijî êrîş, zilm û zextê di 1'ê îlonê de li qadan bin. Naşîdeyê bang li hemû kesî kir ku li dijî zilmê di 1'ê Îlonê saet di 16.00'an de li Qada Îtasyonê bin û da zanîn ku 1'ê îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê ji bo wan xwedî wateyek girîng e û ji bo aştiyek mayînde jî rakirina tecrîdê şert e…*JINNEWS*

